Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :461 nameronahi@gmail.com 05- Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li Şemzînanê li ser şopa gerîla

**Piştî meşa sê saetan me xwe gihand cem yekîneyeke din a gerîla. Nuqteya gerîla li cihekî daristanî bû. Nîvê şevê bi pêşengiya du gerîlayan me dest bi meşa xwe kir.**



Piştî rêwîtiyeke dûr û dirêj em ji Xakurkê digihêjin Şemzînanê. Em li Şemzînanê didin ser şopa gerîla.
Meşa me ya ji deh saetan em gelekî westandibû. Gerîla Rêzan banga 'Rojbaş' li gerîlayan kir û ew hişyar kir. Gava me me bi Rêzan re sohbet dikir, gerîla Sîpan hat cem me û got ku wê me bibe cihekî xweş. Me da dû wî û em bir Girê Teyra ku mîna beşek ji bihuştê bû.
Berêvarê me xatir ji hevalan cuda dihatin rast hatin. Ne li bendê bûm ku li Şemzînanê li ewqas gerîlayan rast bêm.
Li nuqteya gerîla, gerîlayên bi navê Cesûr, Mordem û Rêzan me pêşwazî kirin. Piştî ku me xwarina xwe xwar û çaya xwe vexwar, em razan û bi berbanga sibehê re bi rengekî zinde hişyar bûn.
Berê me li lûtkeya çiyayekî ye. Nêzî 3 saet in em dimeşin. Kêm maye em xwe bigihînin ser serê çiyê. Du gerîlayên ku çav li me ket, ber bi me



xwest û em careke din bi rê ketin. Di dema meşê de em li gelek gerîlayên ji herêmên ve hat. Piştî ku me silav dan hev, em dawetî nuqteya xwe kirin. Piştî ku me ev yekîneya gerîla ziyaret kir, em rêwîtiya xwe didomînin. Em gihîştin cihekî bêhnvedanê. Li vir jî yekîneyeke biçûk a gerîla heye. Kontrola rê û herêmê ji gund tevlî bûne, hinek jî ji metropolan. Li ser israr koma gerîla em şevê li cem wan dimînin.
Piştî ku em ji yekîneya gerîla bêhnê vedidin. Piştî meşa ji saetekê, sê gerîla ber bi me ve tên. Ji niha û pê ve em ê bi wan re bimeşin.
Em dîsa li cihên ku sînor lê dest pê dikin. Rêberên me







ji bo ku balafirên keşfê bi me nehesin dilezînin. Li dû meşeke dirêj em digihêjin yekîneyeke nû ya gerîla. Gerîla nû ji wezîfeyê vegeriyane û betilîne. Em bi hev re taştê dikin. Dûre em diçin cem komeke gerîla ku nan lêdixe. Sê kes in; yek jê mêr e, du jî jin in. Berêvarê em berê xwe didin yekîneyeke din a gerîla û ji nû ve dest bi meşê dikin...*Mahir Yilmazkaya/ANF*

dikin.
Piştî meşa ji sê saetan me xwe gihand cem yekîneyeke din a gerîla. Nuqteya gerîla li cihekî daristanî bû. Nîvê şevê bi pêşengiya du gerîlayan me dest bi meşa xwe kir.
Em du saetan meşiyan û me xwe gihand yekîneyeke gerîla ya bi tevger. Ev yekîneya gerîla bi giranî ji gerîlayên ciwan pêk tê. Hinek ji wan ya bi tevger qut bûn, em gihîştin cihê ku sînor lê bê wate ye. Me plan dikir ku îro xwe bigihînin yekîneyeke din, lê belê ji bo cihê gerîla kişf nekin, bi 4 saetan bi derengî em bi rê ketin. Pêşengên me guherîn. Êdî du gerîlayên jin rêberên me ne. Em di rê de li yekîneyeke din a gerîlayên jin rast tên. Bi erka xwe radibin. Em hinekî li cem wan

## Dewreyeke din ya YPG`ê bi dawî bû

**Li Akademiya Şehîd Sadiq a YPG`ê ya li taxa Şêxmeqsûd a Helebê, dewreyeke nû ya şervanên YPG`ê bi navê Dewreya Şehîdên Helebê bi dawî bû.**
**Dewreya perwerdê ku 45 rojan berdewam kir, di dewreyê de li ser mijarên leşkerî û birdozî perwerde hatin dayîn.**
**Di merasîma bi dawîkirinê de ji fermandarên YPG`ê li Helebê Nûman Çîlo axivî û bi dawîbûna perwerdê li şervanan pîroz kir. Nûman da zanîn ku Sûriye û taybet Bakurê Sûriyê di pêvajoyeke hesas re derbas dibe, lewra pêwîstî bi berxwedanî û fedekarî heye da ku**





**herêmên dagirkirî werin rizgarkirin.**
**Di dawiya merasîmê de, komên navenda Cemîl Horo ya Çand û Hunerê stran gotin...*ANHA***



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 461 05- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

### Feraseta ku Dr. Sîrwan şehîd xist didome



Hêzên PDK'ê di sala 1995'an de Dr. Sîrwan û tevî çare hevalên wî şehîd xistin. Tevî ku 22 sal li ser şehadeta Dr. Sîrwan re derbas buye lê hê jî ew feraseta PDK'ê dewam dike. Birayê Dr. Sîrwan, Yasîn Elî diyar kir ku Dr. Sîrwan kesayetekî netewî bû û girîng dida yekîtiya gelê Kurd."*R-5*

# JIN JI BO RÊBER OCALAN TÊKOŞÎNÊ BILIND DIKIN

**Dewleta Tirk ya dagirker tevî hemû nerazîbûn û fikaran jî tecrîda giran a li ser rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam dike. Malbat û parêzerên Ocalan nikarin biçin Îmraliyê. Bi hatina salvegera komploya 9'ê Cotmehê jî çalakiyên ji bo azadiya Rêber Ocalan zêde dibin.**

Çalakiyên li dijî tecrîdê û ji bo azadiya Rêber Ocalan li herêma Şehbayê dewam dikin. Jinên navçeya Til Rifet û Fafînê yên Şehbayê bi daxuyaniyekê destnîşan kirin ku dewleta Tirk bi tecrîda li ser Rêber Ocalan hewl dide îradeya gelê Kurd û jinan bişkîne û dan zanîn ku ew ê heta dawî li ser rêya Rêber Ocalan bimeşin. ***R-2***

Ji bo azadiya Rêber Ocalan çalakî li Şêxmeqsûd a Helebê jî dewam dikin. Rêxistina Kongreya Star a taxa Şêxmeqsûd bi armanca şermezar kirina tecrîdê bêdengiya raya giştî ya cîhanê bi durûşmeya "Jin ji bo azadiya Rêber Apo û azadiya xwe serî hildidin" çalakiya kon dest pê kir. Çalakî wê sê rojan berdewam bike. ***R-2***



Meclîsa Jinan a HDP'ê, destnîşan kir ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan yekan e astengiya mezin a pêşiya aştiyê ye. Meclîsa Jinan a HDP'ê wiha got, "Ev tecrîda li ser Ocalan belavî hemû civakî hatiye kirin. Ji bo ku rêyên demokratîk û aştiyane li welat bên vekirin, divê em li dijî tecrîda li ser Birêz Ocalan derkevin." ***R-5***

Bi boneya salvegera komploya 9'ê Cotmehê Nivîskar û mamostayê zanîngehê yê ji başûrê Kurdistanê Hawjîn Mela Emîn jî diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze bi tecrîdê pêşî li projeyên Ocalan ên ji bo çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn bigire. Emîn diyar kir ku divê rewşenbîr û nivîskar ji bo azadiya Ocalan bixebitin. ***R-4***

## Bîlançoya 24 saetan: 18 çete hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapeminiyê ya QSD`ê bi daxuyaniyeke bîlançoya şerê 24 saetên dawî yê Qonaxa Dawî a Pêngava Bagera Cizîrê eşkere kir. QSD'ê ragihand ku di encama şerê li eniya Baxoz û Hecîn de 18 çete hatine kuştin. QSD'ê destnîşan kir balafirên koalîsyonê jî gelek baregehên çeteyan rûxandine. QSD'ê ragihand ku pêşdeçûna wan dewam dike. ***R-2***

## Mala Kooperatîfan gelek proje bi cih anî

Li bakur û Rojhilatê Sûriyê xebatên kooperatîfan berdewam dike. Kooperatîf di çareserkirina pirsgirêkên aborî û pêşxistina wê de xwedî roleke girîng in. Bi vê armancê Mala Kooperatîfan a Şedadê ku ev nêzî salekê ye hatiye vekirin xebên girîng meşand û gelek proje ji bo welatiyan bi cih anî. ***R-6***

## Ji ber zextan rewşa Îranê hesas e

Lîderê Olî yê Îranî Alî Xamaney li Tehranê di civîneke de axivî û diyar kir ku ji ber zoriyên aborî û zextên DYA'yê yên li ser civaka Îranê di pêvajoyeke hesas re derbas dibin. Xamaney got, "Li aliyekê qêrîna hêzên mezin û polîtîkayên Amerîka heye, li aliyê din pirsgirêkên aboriya welat, debara welatiyên ku nikarin debara xwe bikin lewaz bûye." ***R-5***



## Hevserokên Komîteyan hatin hilbijartin

Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hevserokên 9 komîteyan hilbijart. Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di civîna 3'ê mehê a li Girê Spî lidar xist de di bin sêwana meclîsê de komîte û rêveberên komîteyan diyar kiribû. Di hevserokatiya komîteyan de hemû pêkhate cihê xwe têde digirin. ***R-2***

## Nexşerêya gelê Sûriyê heye



Endama MSD'ê ya Helebê Fatma Hesîno diyar kir destwerdanên derve sedema bingehîn a gurkirina aloziya Sûriyê ye û da zanîn ku civînên ji derve yên wekî Cenev, Astana û Soçî ji bo Sûriyê çareseriyê pêşnaxin. Fatmayê got, "gelê Sûriyê zana ye û xwedî nexşerêyekê ye." ***R-3***

## Dagirkirina Efrînê dagirkirina tevahî axa Sûriyê ye



Serokê Şaxê Partiya Sûriya Pêşerojê yê Efrînê Mihemed Enwer Miheme diyar kir ku Efrîn parçeyekî girîng yê axa Sûriyê ye û anî ziman ku dagirkirina Efrînê dagirkirina Sûriyê ye. Mihemed got, "Rizgarkirina hemû herêmên dagirkirî yên Sûriyê armanca sereke ya partiya me ye." ***R-4***

## KCK'ê Berhema Salih pîroz kir



Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê namzetê YNK'ê Berhem Salih ku bû Serokkomarê nû yê Iraqê pîroz kir û got, "Di pêvajoyeke wiha de ku pirsgirêkên giran ên siyasî, aborî û civakî hene, em pir girîng dibînin ku rêzdar Berhem Salih hatiye ser meqamekî wiha krîtîk." ***R-4***

## Berhem Salih dikare birînên Iraqê bipêçe



Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dr. Berhem Salih ku bû serokkomarê nû yê Iraqê, pîroz kir û da zanîn ku pêwîstiya Iraqê bi kesayetên wekî wî heye ku dikare birînên gelê Iraqê derman bike û rewşa belavbûyî ya heyî bi dawî bike. ***R-2***

# Em ê herdem li ser rêya Ocalan bimeşin

**Çalakiyên li dijî tecrîdê û ji bo azadiya Rêber Ocalan li herêma Şehbayê dewam dikin. Jinên navçeya Til Rifet û Fafînê yên Şehbayê bi daxuyaniyekê destnîşan kirin ku dewleta Tirk bi tecrîda li ser Rêber Ocalan hewl dide îradeya gelê Kurd û jinan bişkîne û dan zanîn ku ew ê heta dawî li ser rêya Rêber Ocalan bimeşin.**



Jinên navçeya Til Rifet û Fafînê yên Şehbayê bi daxuyaniyekê destnîşan kirin ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rê li pêşiya çareseriyê digire û aloziya herêmê kûr dike.
Di çarçoveya çalakiyên jinên herêma Şehbayê li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de, jinên navçeyên Til Rifet û Fafînê yên girêdayî bi daxuyaniyekê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin.
Bi dehan jin tev li daxuyaniyê bûn. Daxuyanî li ber Mala Zanist û Perwerdeyê ya jinan a navçeya Fafînê hate xwendin.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku ji sala 1999`an ve Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di girtîgeha Îmraliyê di bin tecrîdê de ye.
Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku kiryarên Tirkiyê li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dihêle ku aşitî û demokratîkbûn li Tirkiyê pêk neyê û alozî hê kûrtir bibe.
Jinan di berdewama daxuyaniya xwe de diyar kir ku Tirkiye hewl dide di şexsê Rêber Ocalan de zextê li îradeya gel bike û jinan bike û diyar kirin ku weke jinên Şehbayê ew ê heta dawî bi fikir û felsefeya Ocalan bawer bin û li ser wê bimeşin.
Jinan destnîşan kir ku ew wek jinên kantona Şehbayê bhemû hêz û îradeya xwe ku ji fikrên Ocalan girtine û ew ê têkoşînê bikin ku fikrên Ocalan li hemû cîhanê belav bibe.
Di daxuyaniyê de jinan soza berdewamkirina têkoşînê dan û bang li civaka navdewletî û rêxistinên mafên mirovan kirin ku li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de bê deng nemînin û helwestên xwe nîşan bidin.

## Rêveberiya Xweser Berhem Salih pîroz kir



Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dr. Berhem Salih ku bû serokkomarê nû yê Iraqê, pîroz kir û da zanîn ku pêwîstiya Iraqê bi kesayetên wekî wî heye ku dikare birînên gelê Iraqê derman bike.
Di hilbijartina li parlamentoya Iraqê de Dr. Berhem Salih bû serokkomarê Iraqê yê nû. Der barê mijarê de Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê peyamek weşand.
Di peyamê de wiha hat gotin:
"Bi navê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê em gelê Iraqê li ser hilbijartina serokkomar Dr. Berhem Salih pîroz dikin. Di demekê de ku pêwîstiya Iraqê bi kesayetên ku dikarin birînên Iraqiyan derman bikin û rewşa belavbûnê bi dawî bikin, heye. Her wiha Iraqeke hevgirtî bi hemû pêkhateyên wê ava bikin. Em bawer in ku Dr. Berhem Salih wê bibe kesayeta rast a van hêviyan û bi vê minasebetê em ji wî û gelê Iraqê re serkeftinê dixwazin."

## Hevserokên Komîteyan hatin hilbijartin



Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hevserokên 9 komîteyan hilbijart.
Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di civîna 3'ê mehê a li Girê Spî lidar xist de di bin sêwana meclîsê de komîte û rêveberên komîteyan diyar kiribû.
Hevserokên 9 komîteyên ku di civînê de hatibûn hilbijartin hatin eşkerekirin:
Navên komîte û hevserokan wiha ne:
Komîteya Karên Hundirîn: Elî Mustefa Heco û Hêvî Îbrahîm Mustefa
Komîteya Perwerde û Hîndekarî: Kewser Doko û Receb El-Mişlif
Komîteya Rêveberiyên Herêmî: Jozef Lehdo û Medya Bozan
Komîteya Aborî û Çandiniyê: Selman Tewfîq El-Barodo û Emel El-Xezîm
Komîteya Darayî: Welat Hec Elî û Selwa El-Seyid
Komîteya Çandê: Ebdulsetar Şikagî û Eyşe Elî Receb
Komîteya Tenduristî û Ekolojiyê: Dr. Ciwan Mustefa û Xîtam Xelîl El-Cild
Komîteya Karûbarên Civakî: Farûq El-Maşî û Bêrîvan Hesen
Komîteya Jinan: Serok Cîhan Xidro

## Bîlançoya 24 saetan: 18 çete hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapeminiyê ya QSD`ê bi daxuyaniyeke nîviskî destnîşan kir ku hêzên wan di çarçoveya pêngava dawîn a Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê "Şerê Tunekirina Terorê" ya rizgarkirina bajarokê Hecînê de bi dehan çete kuştin û çek û baregehên wan rûxandin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê bîlançoya şerê 24 saetên dawî di pêngava dawîn a Pêngava Bagera Cizîrê bi daxuyaniyekê eşkere kir.
Daxuyanî wiha ye:
Baxoz
Li wê derê di navabera şervanên me û terorîstên DAIŞ`ê de şer derket. Şervanên me 700 metre bi pêş de çûn û 5 nuqteyên xwe yên nû ava kirin.
Her wiha şervanên me êrîşeke dijwar a terorîstên DAIŞ`ê têk bir. Di encama wê de 2 terorîst hatin kuştin. Terorîstan di êrîşên xwe de çekên giran bi kar anîn.
Her wiha balafirên Koalîsyona Navdewletî gelek baregehên terorîstan kirin hedef. Li wê derê şer û topbaran heta van kêliyan didome.
Hecîn
Piştî şerê dijwar gelek terorîst hatin kuştin. Şervanên me 400 metre bi pêş de çûn. 10 nuqteyên xwe yên nû ava kirin. Her wiha şervanan mayinek ku ji aliyê terorîstan ve di yek ji nuqteyan de hatibû bicihkirin, teqand. Di encama wê de tu zerar çênebûn.
Her wiha şervanên me firokeyeke keşfê ya terorîstan xistin xwarê. Terorîstan jî navendên şervanên me bi çekên doçka û suîqastê gulebaran kirin. Di encama wê de tu zerar çênebûn.
Şervanên me jî bersiva terorîstan da. Lê heta niha tu encam nehatine bidestxistin.
Balafirên Koalîsyona Navdewletî gelek baregehên terorîstan kirin hedef.
Encamên şer
1- 18 terorîst hatin kuştin.
2- Balafirên Koalîsyonê 10 derbe pêk anîn.
3- Zerarên terorîstan: Topavêjek hewanê hate rûxandin, balafireke keşfê hate xistin, her wiha 3 baregehên bicîhkirina terorîstan hatin rûxandin.
4- Mayinek hate teqandin."

## Li dijî tecrîdê çalakiya kon hat destpêkirin

Rêxistina Kongreya Star a taxa Şêxmeqsûdê ya Helebê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û bêdengiya raya giştî ya li hemberî tecrîdê çalakiya konvedanê dane destpêkirin.
Konê çalakiyan bi dirûşma "Jin ji bo azadiya Rêber Apo û azadiya xwe serî hildidin" hatiye vedan, li Qada 7 Şehîdan a taxa Şêxmeqsûd hatiye vekirin.
Jinên ji hemû pêkhateyên taxê Kurd, Ereb, Tirkmen, endamên saziyên sivîl, komîn, meclis, partiyên siyasî û Hêzên Parastina Civakî ya Jin herikîn bin kon.
Di çalakiya kon deli ser navê Kongreya Star Fatima Hesen axivî û bal kişand ser Komploya Navdewletî ya li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan û got: "Komploya ku hebûna gelê Kurd dikir hedef ne gihişt serî. Lê komplo hê jî dewam dike. Mînaka vê yekê jî dagirkirina Efrînê ye."
Wê çalakî 3 rojan berdewam bike.





# Pêngava Hunerê ya li Şêrawa bi dawî bû

**Tevgera Çand û Hunerê ya Efrînê bi durûşmeya"Bi rêgezên Netewa Demokratîk têkoşîn bikin da ku Efrînê rizgar bikin"di 26` Îlonê de pêngava piştgiriya rizgarkirina Efrînê da destpêkirin. Pêngava ku 8 rojan dewam kir li gundê Xirêbkê yê Şêrawa bi çalakiyekî bi dawî bû. Di pêngavê de gelek çalakiyên hunerî hatin pêşkêş kirin.**

Tevgera Çand û Hunerê pêngava ji piştgiriya rizgarkirina Efrînê ku 8 roj bû li herêma Şehba û gundên Şêrawa dabû destpêkirin, li gundê Xirêbkê yê navçeya Şêrawa bi dawî kir.
Tevgera Çand û Hunerê ya Efrînê bi durûşmeya"Bi rêgezên Netewa Demokratîk têkoşîn bikin da ku Efrînê rizgar bikin"di 26` Îlonê de pêngava piştgiriya rizgarkirina Efrînê da destpêkirin. Di pêngava piştgiriyê de, gelek çalakiyên hunerî derbarê berxwedanê de hatin lidarxistin. Di roja dawiyê ya pêngavê de, li dibistana gundê Xirêbkê huner hatin pêşkêşkirin. Bi dehan şêniyên gund beşdarî çalakiyê bûn.
Di çalakiyê de Endama Tevgera Çand û Hunerê Emîne Mûsa axivî û tekez kir ku divê gel çanda xwe biparêzin û da zanîn ku dagirker çi bikin jî nikarin çanda wan tune bikin û ew ji bo rizgarkirina Efrînê bi israr in.
Paşê, koma Çiyayê Kurmênc a girêdayî Tevgera Çandê a Demokratîk govendên xwe pêşkêş kirin. Koma Afrînerên Hêviyê jî şanoyek derbarê rizgariya ji dagirkerî û koletiyê bi zimanê îşaretan, pêşkêş kir. Di çalakiyê de Koma Rojava û Koma Engîzek jî stran gotin…*ANHA*



## Zarokên Serêkaniyê yên mihrîcanê hatin xelat kirin



4.Mihrîcana zarokan li ser asta Herêma Cizîrê ku dibin siya Desteya Çand û Hunerê de di 1'ê Îlona borî de li bajarê Rimêlan bi beşdarbûna 50 komên cûda û ser 9 rojan hatibû li darxistin. Navenda çand û hunera Waşo kanî ya bajarê serê Kaniyê, ew komên zarokan ên Waşo Kanî ku beşdarî 4.Mihrîcana zarokan bûbûn xelat kirin.

### 600 ZAROK BEŞDARBÛN

Yek ji wan koman jî koma zarokan bi hersê beşên xweyî hunerê şano, govend û mûzîkê ya navenda Waşo Kanî bû, ku kêfxwşî xistin dilê beşdarvanan de, bi beşdar bûna malabatên wan hatin xelat kirin. Bi vê mebestê Navenda Waşo Kanî ji bo xelat kirna van zarokan li navenda xwe şahî li darxist, her wiha zarokên dibistna Mûzîkê jî û du dibistan bi giştî 600 zarok beşdarî vê şahiya xelatê bûn.
Komên ku beşdarî mihrîcanê bûbûn û li vê şahiyê hatin xelat kirn evin: "Koma govendê Ş.Darsîn, Şano ya Ş.Merwan û mûzîk Ş.Şînda, her wiha dibistana mûzîkê koma Waşo kanî.

### ZAROK BÎ BALDARÎ BEŞDAR BÛN

Hêjayî gotinê ku ew zarokê dibistanê piştî şahiya hunerî, daxwza kirin ku tevlî beşê hunerî bin, yanî bibin endamê çandê û navê xwe qeyd kirin. Di vê meha Cotmehê de her heftê du caran Yekşem û Pêncşem dê mîna van şahiyan ji bo zarokên Serê Kaniyê lidarbikevin." *Ronahî*

## Pêşengeha rengê xwezayê hat vekirin

Li Mûzexaneya Emnesoreke ya Silêmaniyê pêşangehek bi navê 'rengên xwezayê' hate vekirin.
Li galeriya Mûzexaneya Emnesoreke ya bajarê Silêmaniyê pêşangehek bi navê 'rengên xwezayê' hate vekirin. Pêşangeh ji aliyê şêwekar Teyîb Abdulrehman Baban ve hate vekirin.
Şêwekar Teyîb Abdulrehman Baban pêşangeh pêşkêşê xelkê Silêmaniyê kir.
Baban diyar kir ku demek dirêje ew li ser vekirina vê pêşangehê û çêkirina tabloyan dixebite û biryar da pêşkêşê xelkê Silêmaniyê bike…*ROJNEWS*



## Tablo ya herî mezin a dara zeytûnê




3 şêwekaran di çarçoveya piştgiriya Berxwedana Serdemê ya Efrînê de bi hevkariya Weqfa Jinên Rewşenbîr ên Herêma Cizîrê, tabloya herî mezin a dara zeytûnê çê kirin.
Di çarçoveya piştgiriya Berxwedana Serdemê ya Efrînê, 3 şêwekaran bi hevkariya Weqfa Jinên Rewşenbîr ên Herêma Cizîrê çêkirina tabloyeke mezin a dara zeytûnê bi dirêjahiya 10 metreyan û bi firehiya 5 metreyan bi dawî kir.
Li jêra tabloyê bi zimanên Erebî û Kurdî gotina "Efrîn ew ê hêşîn bimîne" hate nivîsandin. Tê payîn ku ev tablo li bajarê Qamişlo were daliqandin…*ANHA*

## Kolan bi kolan digere û amûrên kevnar difiroşe

Silêman Kaya li kuçe û kolanên Rihayê bi ereboka destan amûrên kevnar difiroşe.
Kaya ku li kuçe û kolanên Rihayê bi ereboka desta amûrên kevnar dikire û difiroşe, diyar kir ku 15 sal in ew vî karî dike. Di dest Kaya de amûrên 10 sedsal berê hene.
Kaya, diyar kir ku ew her roj li taxên bajêr digere. Kaya, da zanîn ku her çend bi piyan zehmet be jî, lê dema ew digere kêfxweş dibe.
Kaya, destnîşan kir ku her roj ew tevî ereboka xwe ya destan 20 kîlometre rê dimeşe û got: "Bi piranî amûrên kevnar ne li taxên luks, lê li taxên kevn ên Rihayê peyde dibin. li Sûka Sifiran dikanek amûrên kevnar difroşe, lê ji min pêvtir kes bi ereboka destan vî karî nake. Hema bêje li tevahiya herêmê kesek wisa tune ye. Lê ez pir jê qezenc nakim. Carina heye hefteyekê jî tiştekî nafiroşim. Amûrên kevnar ne ji bo pêdiviyê ji bo kêfê tên kirrîn, yanî bala herkesî nakişîne. Dema mirovên ji tiştên kevnar hez dikin min dibînin çend perçeyan bi hev re dikirrin. Jixwe çend perçe eşya bifiroşim, têra min a mehekê dike."
Kaya, anî ziman ku di dest wî de her cure perçeyên kevnar hene û ji ber ku bi salan e vî karî dike ji amûrên kevnar pir fam dike. Kaya bilêv kir ku ew ji nexşên li ser amûrên kevnar ên sifir û tûncî fêm dike ku amûr aîdî kîjan civakê ne. Kaya anî ziman, di dest wî de gelek amûrên kevnar ên aîdî Ermenî û Suryaniyan hene.
Silêman Kaya, diyar kir ku her çend karê wî zehmet be jî, lê jê hez dike û got: "Heqê nan wisa ne hêsan e. Min dikaribû karekî din jî bikirana, lê ji vî karî hez dikim. Carinan hin mirov qîmetê nadin amûrên kevnar dixwazin bi erzanî bikirrin. bihayê ku ez dibêjim ji wan re zêde tê. Lê qîmeta her tiştekî heye."…*MA*



# Mala Kooperatîfan gelek proje bi cih anî

**Li bakur û Rojhilatê Sûriyê xebatên kooperatîfan berdewam dike. Kooperatîf di çareserkirina pirsgirêkên aborî û pêşxistina wê de xwedî roleke girîng in. Bi vê armancê Mala Kooperatîfan a Şedadê ku ev nêzî salekê ye hatiye vekirin xebên girîng meşand û gelek proje ji bo welatiyan bi cih anî.**





Mala Kooperatîfan a Şedadê, bi armanca bilindkirina asta aboriya welatiyên navçeyê gelek proje bi cih anîn.
Bi armanca peydekirina pêwîstiyên bingehîn ên civakê û pêşxistina aboriya herêmê, Mala Kooperatîfan a Şedadê ya ku kooperatîfên herêma Şedadê ya girêdayî Hesekê birêxistin dike, gelek proje bi cih anîn.
Di 1'ê Mijdara 2017'an de Mala Kooperatîfan hate vekirin. Ji destpêka vekirina kooperatîfê ve, gelek proje bi cih anîne. Jê firinek li ser bingeha koopereratîfan vekir. Projeya jenetora kehrebeyê li gundên El-Reşîdiye û Serab ku 6 malbat şirîkên hev in, projeya kargeha xwê ya ku dikeve gundê El-Reşdiyê û her wiha werşeya dirûtinê ku 50 kes tê de şirîk in, vekirin.
Kooperatîfê niha gelek projeyan nîqaş dike, jê projeya hola înternetê ku tê de 50 kes şirîk in û projeya zeviyên çandiniyê bi rûbera 50 donim û tê de 5 malbat şirîk in.
Têkildarî mijarê Endama Rêveber a kooperatîfê Hena Ehmed destnîşan kir ku armanc ji vekirina kooperatîfê ew e ku pêwîstiyên welatiyan peyde bike û aboriya navçeyê bi pêş bixe. Hena anî



ziman ku di dema DAIŞ`ê de rola welatiyan hatibû paşguhkirin.
Hena diyar kir ku niha ew du projeyan; projeya hola înternetê û projeya zeviyên çandiniyê nîqaş dikin.
Di dawiyê de Hena Ehmed bang li şêniyan kir ku projeyên xwe bi armanca xizmeta herêmê pêşniyar bikin. Hena destnîşan kir ku ew amade ne hevkariya welatiyan bikin û alîkariyê bidin wan…*ANHA*

## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Hevjiyana Azad -4-

**Abdulah Ocalan**

Xulase, felsefeya jiyanê ya xwe disipêre zêdebûna bi jinê re maneyek xwe ya ciddî nîne. Di civaka çînî de diyardeyên weke mîrate û bihêzbûnê mane li jina dizê bar kirine û ev jî maneyeke têkiliya xwe bi mêtinkarî û zordestiyê re heye û ji bo jinê negatîf e. Ango jina gelekî dizê ew jin e ku zû dimire. Eger kêm zayîn yan jî bi giştî pirsgirêka pirrbûna şêniyan li cem cinsê mirov hebe, hingê jiyaneke bi jinê re ya maneya wê gelekî payeberz bi jina hîç nazê re pêkan e. Gelên mêtingeh ên paşvemayî yên nikarîbûne weke civak û ferd xwe bi hêza polîtîk û entelektuel pêşde bibin, pirrzarokanîn dikare ji bo wan weke xweparastinekê qîmeta xwe hebe. Ji bo pêşî li qirkirina xwe bigire, bi anîna gelek zarokan dewamkirina zurriyetê jî rêbazeke bersivdanê ya berxwedanê û dewamkirina hebûnê ye. Lê ev xweparastina wan civakan e ku şensê wan ê jiyaneke azad zêde nîne. Lewma di civakên wisa de ku asta maneyê gelekî ketiye, bi jinê re jiyaneke li ser bingehê rast û estetîk mumkîn nîne. Rastiya civakên heyî yên dinyayê vê yekê piştrast dike. Jiyana bi jinê re di warê bergirî û xwe xwedîkirinê de aliyekî xwe yê xweser nîne. Bergirî û xwe xwedîkirin ji bo her zindî û ruhberî heye. Zêde manedar nîne ku mirov jiyana bê jin an jî bê mêr guftûgo bike. Di tevahiya jiyanên cot û fer de diyardeya nêrtî û mêtiyê heye. Ango pirsgirêk ne bi xwe bi hevjiyanê re, bi maneya wê re ya di civaka mirov de ye.
Civaka mirov şêwazekî jiyanê yê zindî yan jî ruhberekî nîne. Xwedî xisletên wisa ye ku dikare di nava xwe de û li ser xwezayê diyardeya hukimranî û desthilatdariyê pêş bixe. Çawa ku em di desthilatdariya dewleta netewe de dibînin, ji aliyê hejmar û naverokê ve pêkanîna wê ya herî zêde dikare dinya me ya jiyanê veguherîne qebra jiyanê. Li vir rewşa çeloxwarî ji ber civakê ango civaka mêrê serwer pêk tê. Hegemonya mêrê serwer li ser jinê pêk tîne dinya me dixe rewşekê ku dike jiyan lê nebe. Ev encam jî ne bi beridîneke biyolojîk, lê bi desthilatdariya hegemonîk a bi serweriya mêr tê. Ango divê jiyana bi jinê re ji diyardeya desthilatdariya hegemonîk a bi serweriya mêr rizgar bibe. Jina ku jiyana wê di bin hukimraniyê de derbas dibe, bi zarokanînê mirovatî mîlyonan sal dewam kir, lê bi modernîteya kapîtalîst re ev xisleta wê ya zarokanînê bi awayekî îronîk dawiyê li jiyanê tîne. Jiyan bi jina di bin vê statuya heyî de nîşaneyên dawîhatina li jiyanê nîşan dide. Bêhejmar nîşaneyên vê rastiyê hene. Eger em wan rêz bikin:
a- Şênî di vê dinya me de hilnayên û gihiştiye qonaxekê ku hebûna ruhber û zindiyên din jî dixe tehlûkeyê. Jiyaneke bi vî awayî bi wê jinê re ya di vê statuya heyî de, xwezayîbûn û ekolojiya jiyanê her roja derbas dibe bileztir dixe tehlûkeyê.
b- Dîsa ev jiyan di nava civakan de û li derveyî wan rê li ber şîddeta desthilatdariyê ya bêsînor vedike. Asta milîtarîzm gihiştiyê vê rastiyê têra xwe piştrast dike.
c- Seksualîteya jinê bi awayekî xeternak tê bikaranîn û li ser vê zordestî û mêtinkariyeke xeternak hatiye pêşdebirin. Jiyan bi tevahî ji rê hatiye derxistin, hema bêje bi jirêderketineke cinsî re ya ku xwe bêmane dubare dike, kirine yek.
d- Jina di civakê de kirine ne tiştek û pêjna wê nayê, kirine makîneyeke zurriyetê dewam bike, metayeke cinsî û hêza herî erzan a karkirinê. Mîna ku maneyeke wê ya din tine be.
e- Mîna ku li ser jinê qirkirineke çandî tê meşandin. Lê bi rola xwe ya seksualîte û dewamkirina zurriyetê weke artêşeke karkerên bêheqdest an jî bi heqdesteke erzan dixebite nirxekê îfade dike. Ji bo karibe xwe ji aliyê fizîkî, exlaqî û manewî ve biparêze ew ji hêza wê mehrûm kirine.
f- Di nava van faktoran de civakeke jinê di nav lepê jiyaneke bêmane de biperpitîne û binalîne, ew civak bi tenê dikare nexweş be. Jina bêmane wê civaka wê jî bêmane be.

## Li Eyn Îsa pêşketina jiyana civakî

Di dema rêjîma Baasê de navçeya Eyn Îsa di aliyê xizmetê de hatibû paşguh kirin. Ji ber vê yekê şêniyên navçeyê koçber bûn. Piştî ku navçe ji DAIŞ'ê hat rizgar kirin di hemû qadên civakê de gelek guhertin pêk hatin.
Ji sala 2011`an ve ji destpêka



aloziya Sûriyê welatiyên Eyn Îsa'yê gelek zehmetî dîtin.
Komên çekdar û çeteyên DAIŞ`ê herêm xistin bin serweriya xwe, ji ber wê jî jiyana navçeyê hilweşandin û şêniyên wê zêdetirî 5 salan koçber man. Lê ji destpêka ku di sala 2015`an de ji aliyê şervanên YPJ/YPG`ê ve hate rizgarkirin, gelek pêşketinên berbiçav li wê derê çêbûn û aramî û ewlehî li herêmê ava bû.
Îro li navçeyê gelek pêşketinên berbiçav pêk hatine. Aramî û ewlehî li herêmê heye. Xizmetguzarî li herêmê pêş ketiye. Gelek pêşketin di aliyê civakî û madî de çêbûne. Her wiha biye navenda biryarên siyasî û leşkerî. Ji bo hemû pêkhateyan Sûriyê bûye mînaka jiyana hevbeş…*ANHA*

## 15 hezar xwendekar diçin dibistanan



Di sala duyemîn a xwendinê de li navçe û gundewarên Eyn Îsa hejmareke zêde ji şagirtan berê xwe da dibistanan.
Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya navçeya Eyn Îsa, hewl dide nifşekî nû bi rêka kadroyên xwendinê ku di havîna çûyî de perwerde dîtibûn, ava bikin.
Hejmara dibistanên ku hatin amadekirin ji bo sala nû ya xwendinê, gihişt 150 dibistanên astên seretayî û amadehî ku hejmara şagirtên wê 15 hezar e.
Berdevka Komîteya Perwerdeyê ya Eyn Îsa Henan El-Zahêr li ser mijarê axivî û wiha got :"Her şagirtek bi zimanê xwe yê dayikê dixwîne."
Henan El-Zahêr destnîşan kir ku hemû mamoste di havînê de dewreya perwerdeyê dîtin, encamên wê jî baş bûn û hemû dibistanan mamosteyên xwe girtin û wiha got: "Ev pêngaveke baş e ji bo pêşxistina perwerdeya li herêmê. Pêdiviyên dibistanan ji bo demsala zivistanê hemû amade ne û dema bê xwestin wê were danîn."
Derbarê mijarê de mamoste Nesrîn El-Xemîs wiha axivî: "Asta xwendekaran baş e û em ê hewl bidin xwendekarên xwe bi pêş bixin."
Berdevka dibistana Ismayîl El-Hemed, Cîhan Kobo wiha got: "Tiştê ku hate serê xwendekaran ku ji dibistanê qut bûn, hişt ku xwendekar berê xwe bidin tiştên din, ji bo wê em ê hewl bidin asta xwendinê ji wan re zêde bikin ku bigihîjin civakeke xwende."…*ANHA*

## Welatî ji ber bîra petrolê gazincan dikin

Welatiyên gundên rojavayê navçeya Til Hemîsê, ji ber pirsgirêka bîra petrolê ku xetereyeke mezin li ser wan û hawîrdorê çêdike, zehmetiyan dikişînin. Heta niha Şaredariya Gel pirsgirêk çareser nekriye.
Şêniyên gundên Til Lehem û Im El-Rûs ên rojavayê navçeya Til Hemîsê, ji çend salan ve ji ber bêhna genî ya bîra petrolê ku nêzî wan gundan e, gazincan dikin. Lê heta niha Şaredariya Gel a navçeya Til Hemîsê ev pirsgirêk çareser nekiriye.
Welatiyan destnîşan kir ku bîr pirsgirêkeke cidî ye û li ser herêmê xetereyek e. Welatiyan diyar kirin ku ew ditirsin ku zarokên wan bikevin bîrê yan jî dema pê bilîzin xwe bişewitînin. Her wiha ji ber ku bîr nêzî çêregeha sewalan e, fikarên welatiyan derbarê sewalan xwe de jî hene.
Xelkê her du gundan li benda şaredariyê ne da ku pirsgirêkê çareser bike û rê li ber zêdekirina qirêjbûna hawîrdorê bigire. Welatiyan da zanîn ku ev pirsgirêk beriya 6 salan derketiye holê. Komên çete wekî Cebhet El-Nusra û Ehrar El-Şam da ku sûdê ji bîrê wergirin ev bîr kolandin û bîr wiha hiştin.
Têkildarî mijarê welatiyê bi navê Ehmed El-Xidir ê ji gundê Til Lehem wiha axivî: "2 mîhên min ketin bîrê, min hewl da wan xilas bikim lê ez jî ketim bîrê, mirovek dema ku di ber bîrê re derbas dibû ez û mih ji bîrê derxistin."
Şaredariya Gel a navçeyê soz da ku di demeke nêz de vê pirsgirêkê çareser bike…*ANHA*





# Nexşerêya gelê Sûriyê heye

**Endama MSD'ê ya Helebê Fatma Hesîno diyar kir destwerdanên derve sedema bingehîn a gurkirina aloziya Sûriyê ye û da zanîn ku civînên ji derve yên wekî Cenev, Astana û Soçî ji bo Sûriyê çareseriyê pêşnaxin. Fatmayê got, "gelê Sûriyê zana ye û xwedî nexşerêyekê ye."**

Endama MSD'ê ya Helebê Fatma Hesîno diyar kir destwerdanên derve sedema bingehîn a gurkirina aloziya Sûriyê ye û da zanîn ku gelê Sûriyê zana ye û xwedî nexşerêyekê ye. Fatma got, "çareserkirina aloziya Sûriyê beyî danûstandinên gelê Sûriyê ne pêkan e.
Endama Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Fatma Hesîno desnîşan kir ku ji bo peydekirina çareseriyeke bingehîn ji aloziyê re ew wek MSD ji danûstandinare amade ne. Fatmayê anî ziman ku ya girîng berjewendiyên gelên Sûriyê ne.
Fatma wiha axivî: "Bi destwerdana Tirkiyê li Sûriyê û piştgiriya Tirkiyê ji bo komên çete hişt ku aloziya Sûriyê kûr bibe. Tirkiyê ji ber tirsa xwe ji projeya demokratîk a li bakurê Sûriyê pêş dikeve, herêma Efrînê dagir kir."
Fatme Hesîno wiha dewam kir: "Hemû civînên ku bi armanca çareserkirina aloziya Sûriyê tên lidarxistin wekî Cinêv, Soçî û Astana bi ser neketin û çareseriyeke siyasî rast ji aloziyê re nedîtin."
Di dawiyê de Endama Meclisa Sûriya Demokratîk a Helebê Fatme Hesîno wiha got: "Çareserî bêyî danûstandina di navbera hemû gelên Sûriyê de ne pêkan e. Gelê Sûriyê zana ye xwedî nexşerêyeke siyasî ya çareseriyê ye. Em wek Meclisa Sûriya Demokratîk ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê amade ne bi hemû pêkhateyên Sûriyê re danûstandinan bikin."...*ANHA*



## Rêber Ocalan komplo pûç kir




TJK-E'yê diyar kir xeta jinên azad ku di nava têkoşîna dijî kompoyê de veguherî tevgereke civakî, ji bo gelê Kurd û mirovahiyê bûye garantiya jiyana azad.
Tevgera Jinên Kurd li Ewropayê (TJK-E) bi wesîleya salvegera 20'an a Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê daxuyaniyeke nivîskî da û bang li gelê Kurd, hêzên demokratîk û tevgerên jinan kir ku bi xurtî tevlî çalakiyên ji bo şermezarkirina kompoyê bibin.
Daxuyaniya TJK-E'yê ya li ser mijarê wiha ye: "Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê, ji ber têkoşîna bê eman a Rêberê me bi ser neket û komplo pûç bû. Em sala 20'an a komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê weke saleke girîng a têkoşînê pêşwazî dikin. Komplogeran di nava 20 salên bihurî de kir nekir nekarîn armanca xwe pêk bînin û li pêşiya xurtbûna îradeya azadiyê ya gelê Kurd nekarîn bibin asteng. Nekarîn pêşî li Kurdan bigirin ku li Rojhilata Navîn bibin model. Hêzên ku fêhm kirin nikarin pêşî li sîstema gelê Kurd bigirin, dixwazin komplo û polîtîkayên tinekirin û qirkirinê yên xwe dispêrin şer ji nû ve bixin rojevê. Di bingeha van êrîş û polîtîkayên şer de rejîma qirkirina gelê Kurd heye.
Polîtîkayên taybet ên li Îmraliyê, sîstema tecrîdê weke sîstemeke êşkenceyê li dijî mirovahiyê û hemû hêzên azadîxwaz tê birêvebirin. Dewleta Tirk a faşîst ku ji demokrasiyê bêpar maye û hemû normên hiqûqî binpê dike, ev sîstema giran roj bi roj kûrtir kir û şerê qirkirinê bi vê yekê re dijwar kir. Dewleta TC a faşîst van sê salên dawî bi kiryarên herî giran radibe.
Ev polîtîkaya êrîşê bêguman bi taybetî li dijî paradîgmaya modernîteya demokratîk a Rêbertî tê kirin ku ev paradîgma bûye hêvî û xeta jiyana azad ji bo gelan. Ev 19 sal in êrîş li paradîgmaya jiyana azad û demokratîk a Rêberê me tê kirin ku ji bo gelên herêmê, jinan û Kurdan pêşkêş kiriye.
Sê sal in têkiliya Rêberê me bi derve re bi temamî hatiye birîn, tecrîdeke giran lê tê ferzkirin û derbarê tenduristî, ewlekarî û jiyana wî de agahiyek bi dest nakeve. Li dijî êrîşên nû yên hêzên komploger ên navneteweyî, weke tevgera jinên azad em bi biryar in ku li her qadê li ber xwe bidin. Em bang li gelê xwe dikin bi taybetî jî li jinan, ku li her qadê tevlî vê berxwedanê û pêvajoya avakirinê bibin û bi erk û berpirsyariya xwe ya dîrokî rabin. Di 6 û 9'ê Cotmehê de wê ji bo şermezarkirina komploya navneteweyî çalakî werin lidarxistin. Em bang li gelê Kurd bi taybetî jinan, li hêzên demokrasiyê, tevgerên jinan û dostên xwe dikin ku bi rengekî aktîf beşdarî van çalakiyan bibin."

## Hemleya parastina ji nexweşiya pençeşêrê



Bi armanca hişyarkirina û parstina nexweşiyê Weqfa Jina Azad bi alîkariya Heyva Sor a Kurd re di meha Cotmehê de dest bi hemleya hişyarkirina nexweşyia pençesêra pêsîran kiriye. Ku beriya niha jî mîna van çalakiyan hatibûn kirin û ev berdewamiya wane, her wiha ev hemleya ser asta Herêma Cizîrê û kampên di hundirê Herêmê de ye."
Ev hemleya di bin dûrûşmeya "Em bihevre çareseriyê ji nexwşiya pençe şêra pêsîran bibînin" bi armanca hişyarî û parastin û kêmkirna vê nexweşiyê de zêde bikin, da ku vê nisbeya nexweşî û mirinê kêm bikin. Her wiha jinan ser mijarên çawaniya parastin, rîsk û nîşaneyên vê nexwşiyê çine hîn dikin. Ji ber ku nexwşiya pençe şêra pêsîran nexweşiya ku di nav jinên cîhanê de gelek belav bûye û ev nexweşî bûye sedema duyemîn ji mirin, re.
Tevî ku rêbazek tam ji parstina vê nexweşiyê nîne jî lê gavên wê kêmkirinê hene ser vê mebestê jî Bernameya hişyarikinê ser van mijarên wekî: Rêbaz, xwerina disiplînî, werzîşa bedenî, kengî û bi çi rêbazî anîna zarokan û demên xwerina derman û yagirîn nevexwarina çixaran ne. Da ku hişyarkirin zêde bibe ji hêla pisporan ve hemû bi rengê semîner û proşor têne kirin."***Ronahî/ Qamişlo***

## Bi tecrîdê krîza li Tirkiyê kûrtir buye



Salîha Aydenîz diyar kir ku bi tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, gelên Kurd, Tirk û gelên Rohilata Navîn zirarê dibine û got: "Ji bo Tirkiyek demokratîk û Kurdistanek azad divê Birêz Ocalan azad bibe."
Parlamentera HDP'ê ya Amedê Saliha Aydenîz, tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, destûr nedayîna hevdîtina parêzer û malbatê û biryara DMME'yê nirxand.

**SÎSTEMA ÎMRALIYÊ SIYASÎ Û TAYBET E**

Aydenîz destnîşan kir ku tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan zirarê dide gelên Rojhilata Navîn û wiha axivî: "Tecrîd di sala 1999'an û vir de bi awayek sîstematîk, li ser gelê Kurdistanê û tevahiya gelên Rojhilata Navîn tê meşandin. Zêdetirî sê sale tecrîdek giran û mînaka wê li ti welatî nîne li ser Birêz Ocalan tê meşandin. Sîstema Îmraliyê siyasî û taybet e. Çawa nêzîkatiya dewletê li hemberî Îmraliyê taybet e, nêzîkatiyên welatên Ewropa û CPT'î jî ji bo Îmraliyê taybet e. "

**DIVÊ OCALAN AZAD BIBE**

Aydenîz,bal kişand li daxwazên hevdîtina parêzer û malbatê ya ji bo Îmraliyê û wiha dewam kir: "Heta niha daxwazên hevdîtinê yên li gel Birêz Ocalan bi hincetên koster xirabûye û rewşa hawayê dihat qedekirin, niha jî bi hinceta cezayê disiplînê daxwaza hevdîtinê tê qedexekirin. Divê ev tecrîd bê rakirin û demildest Bîrêz Ocalan azad bibe. Şer bi tecrîtê re kûrtîr dibe, tenê Kurd zirarê nabînin, hemû gelên Rojhilata Navîn ji vê tecrîdê zirarê dibîne."

**BI TECRÎDÊ KRÎZ KÛR BUYE**

Parlamentera HDP'ê ya Amedê Salîha Aydenîz bal kişand ser biryara DMME'ê ya redkirina serlêdana êşkence û muameleya xerab a Ocalan û got, "DMME'ê rol û misyona xwe ya parastina mafên mirovan winda kiriye. DMME ji sibata 1999'an heta niha rewş û şertên Ocalan û girtîgeha Îmraliyê baş dizane. Lê balkêş e biryara DMME'ê ya 27'ê Îlonê nîşan dide ku rol û misyona xwe binpê kiriye. Ji pîvan, hiqûq û rêgezên xwe dûr ketiye. Biryara DMME'ê girêdayî sekna Ocalan û polîtîkayên Tirkiyê ye. DMME, pîvan û çeperê lêpirsînê li gorî hikûmeta Tirkiyê dinirxîne. Li vir pergala Îmraliyê ji nedîtî ve tên. Girtîgeha Îmraliyê li gorî Birêz Ocalan hatiye avakirin. Ji hewa û bejayî ve hemû der û dorê wê hatiye qedexekirin."
Aydenîz diyar kir ku perspektîfên Ocalan rêya Tirkiyê ronî dike û wiha got: "Di sala 2013, 14 û heta 15 pêvajoya aştiyê ji aliyê Birêz Ocalan ve hate destpêkirin. Her kesê bi awayek vekirî dît ku çawa perspektîfên Ocalan rêya aramî û aştiyê vedike. Ramanên Ocalan ronîkirina Tirkiye, Kurdistan û tevahiya Rojhilata Navîn e. Divê serdemê de Tirkiye di hindirê welat û ji derveyî welat xitimiye û tenê rêyek vê heye ev jî dawîkirina tecrîda girankirî ya li ser Birêz Ocalan e. Birêz Ocalan bûyer û geşedanên bi qewîme berî çend salan dibîne û rêyên çareseriyê pêşniyar dike. Pêşdîtinên Ocalan yên berî niha hişyar kirîbû yek bi yek pêkhatin. Raman û pêşniyarên Birêz Ocalan pêşî li geşedanên li Rohilata Navîn digre û rêyên aramiyê nîşan dide. Bi tecrîda girankirî re li Tirkiyê hemû rêyên siyasetê xitîmin û krîzek kûr li Tirkiyê ketiye dewrê."

# KCK'ê Berhem Salih pîroz kir

**Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê namzetê YNK'ê Berhem Salih ku bû Serokkomarê nû yê Iraqê pîroz kir û got, "Di pêvajoyeke wiha de ku pirsgirêkên giran ên siyasî, aborî û civakî hene, em pir girîng dibînin ku rêzdar Berhem Salih hatiye ser meqamekî wiha krîtîk."**



Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê namzetê YNK'ê Berhem Salih ku Sêşemê bi dengdanê bû Serokkomarê nû yê Iraqê pîroz kir. KCK'ê Dr. Berhem Salih bi peyamekê pîroz kir, ji bo ku Salih bû Serokkomar kêfxweşiya xwe diyar kir û got, ''Di pêvajoyeke wiha de ku pirsgirêkên giran ên siyasî, aborî û civakî hene, em pir girîng dibînin ku Rêzdar Berhem Salih hatiye ser meqamekî wiha krîtîk.''
Peyama pîrozbahiyê ya KCK'ê wiha ye: ''Di encama hilbijartinê ya Parlamentoya Iraqê de, bi desteka piranî ya endamên parlamentoyê bi Serokkomarî hilbijartina Rêzdar Dr. Berhem Salih bi kêfxweşî pêşwazî dikin û wî pîroz dikin. Em hêvî dikin ku ev peywira giran ku Rêzdar Berhem Salih hilgiriye û ev berpirsyarî ji bo hemû gelên Iraqî bibe ya xêrê. Di pêvajoyeke wiha de ku li Başûrê Kurdistanê, Iraqê û li Rojhilata Navîn pirsgirêkên giran ên siyasî, aborî û civakî hene, em pir girîng dibînin ku Rêzdar Berhem Salih hatiye ser meqamekî wiha krîtîk.
Pir girîng û binirx e ku Rêzdar Berhem Salih ji parlamentoyê ku temsîla gelek nasnameyên etnîk, dînî û mezhebî dike, destek standiye û bûye serokkomar. Ev rewş encama wê ye ku Rêzdar Berhem Salih di tevahiya jiyana we bi hemû derdorên civakî û siyasî re dida û distand, her wiha nîşana wê ye ku hemû gel derbarê çareseriya pirsgirêkan jê bawer dikin û jê hêvîdar in.
Em bawer dikin ku Rêzdar Berhem Salih wê bibe layiqî vê pêbawerî û jê hêviyê. Em hêvî dikin ku bi hişmendî û siyaseta xwe rê li ber wê veke ku gelên Iraqê ji dorpêça etnîk, dînî û mezhebî rizgar bibe û hişmendî û jiyaneke demokratîk ava bike.
Em hêvî dikin ku di serî de pirsa Kurd ji bo çareseriya li ser rêgez û nirxên demokratîk a hemû pirsên siyasî, aborî û civakî yên Iraqê bibe pêşgavek. Bi vê çarçoweyê em careke dî kêfxweşiya diyar dikin ku Rêzdar Berhem Salih bûye Serokkomarê Iraqê û em pîrozbahiyê lê dikin."

## Divê rewşenbîr li dijî tecrîdê rabin

Nivîskar û mamostayê zanîngehê Hawjîn Mela Emîn diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze bi tecrîdê pêşî li tez û projeyên Ocalan ên ji bo çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn bigire û got; "Nivîskar û rewşenbîran weke tê xwestin ji bo azadiya Ocalan nexebitîne."
Roja 9'ê Cotmehê 20 sal di ser komploya navnetewî ya dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re derbas dibin. Dewleta Tirk niha li ser Ocalan tecrîdek di asta êşkenceyê de pêk tîne. Zêdetirê 7 salane destûr nade parêzer biçin Îmraliyê. Malbat jî 2 salin nikarin biçin Îmraliyê serdana Ocalan.
Nivîskar û mamostayê zanîngehê Hawjîn Mele Emîn derbarê tecrîdê axivî û diyar kir ku komploya li dijî Ocalan, komployek navnetewî bû û wiha dewam kir; "Armanca komployê tinekirina projeya rizgarîxwaz a gelê Kurd, xebat û berxwedana heyî bû."
Li ser bandora tezên Ocalan ji bo çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn jî Emîn wiha axivî; "Girtina Ocalan û ev tecrîda li ser tê meşandin, ji bo pêşîgirtina li tezên çareseriyê yên Ocalan e."
Li ser erka rewşenbîran a li hemberî tecrîd û êşkenceya li dijî Ocalan tê meşandin jî, Emîn got; "Weke rewşenbîr, nivîskar, kesên xwedî helwest û rêxistinên medenî pir kêm xebat kirine. Pêwîst bû zêdetir kar kiribana û ji bo rakirina tecrîdê hewldanên zêdetir bikirana."
Hewjîn Mele Emîn di dawiya axaftina xwe de wiha got; "Tecrîdkirina Ocalan û hemû zextên dewleta Tirk, bingeha xwe ji hovîtiya dewleta Tirkd digirin. Dewleta Tirk naxwaze hebûna Kurdan li Rojhilata Navîn qebûl bike. Dewleta Tirk hebûna Kurdan ji bo xwe metirsî dibine."…*ROJNEWS*



## Dagirkirina Efrînê dagirkirina tevahî axa Sûriyê ye



**Idrîs HENAN**

Mihemed Enwer Mihemed Serokê şaxa Partiya Sûriya Pêşerojê li Efrînê destnîşan kir ku; Partiya Pêşerojê weke hewceyeke dîrokî ji bo çareseriyas aloziya Sûriyê hatiye damezirandin û wiha dewam kir: Zêdeyî heft salan e sahaya Sûriyê rastî pirsgirêk û aloziyeke cidî hatiye. Piraniya kombûyînên siyasî bûne piyon di destê hêzên derve de. Vê yekê jî azweriyên gelên Sûriyeyê kiriye xeteriyê. Ji ber vê yekê hewce bû ku aliyek xwedî bernameyek siyasî welatparêz hebe hêviyên gelên Sûriyeyê pêk bîne, bête damezirandin. Ew jî Partiya Sûriya Pêşerojê bû. Mihemed rêxistinbûna partiyê jî wiha rave kir: Şaxa partiyê li Efrînê ji serok, cîgir û gelek komîteyan pêk tê.

### EFRÎN, BAB Û IDLIB AXA SÛRIYÊ NE

Li ser rola partiyê û têkoşîna wê piştî dagirkirina Efrînê Mihemed got: Piştî ku Efrîn hat dagirkirin, me destê xwe xiste destê saziyên Rêveberiya Xweser. Ji bo ku partiya me bi rola xwe ya neteweyî rabe û civaka Efrînê li koçberiyê bi rêxistin bike, li herêmên Şehbayê komîteyên xizmet û xwedîderketina li gelê Efrînê yên hevbeş bi Rêveberiya Xweser re ava kir.
Mihemed di vê derbarê de wiha dewam kir: Partiya Sûriya Pêşerojê partiyeke Sûriyeyî niştimanperwer e. Armanca xwe yekparebûna axa Sûriyeyê ye. Dagirkirina dewleta Tirkiyê ji axa Efrînê re tê wateya xesibkirina axa tevahî Sûriyê. Efrîn parçeyekî girîng ê axa Sûriyeyê ye. Eerkekî me yên niştimanî, siyasî û exlaqî ye ku Efrîn bête rizgarkirin. Mihemed di dirêjahiya nirxandina xwe de got: Çawa ku Efrîn parçeyekî axa Sûriyê ye, her wiha Idlib, Bab û Cerablus jî parçeyên girîng ên vê xakê ne. Rizgarkirina van bajaran dozên bingehîn ên têkoşîna partiya me ne.

### TÊKOŞÎNA HEVBEŞ ESAS E

Mihemed Enwer Mihemed Serokê şaxa Partiya Sûriya Pêşerojê li Efrînê di dewama axaftina xwe de behsa pêşketinên siyasî li herêmê kir û ev tişt anî ziman: Tabloya siyasî diyar dike ku berjewendiyên hêzên derve bendorek mezin li ser çareseriya aloziya Sûriyeyê kiriye. Li gorî ji nû ve xwe-dîzayinkirina hêzan li ser axa Sûriyê, diyar dibe ku Sûriyê ber bi parçebûnê ve diçe. Eger hêzên siyasî yên bi bandor ên Sûriyeyî mudexeleyî vê rewşê nekin, wê şansê vê sanryoyê hakim be. Ji be vê yekê, pêwîste hêzên niştimanî pêkve têkoşîneke cidî ku yekpariya axa Sûriyê biparêzin, bikin. Ji bo vê jî, hevgirtineke siyasî û têkoşîneke neteweyî lazim dike.

### ALIYÊN MUTEFÎK NE REWA NE

Mihemed di nav nirxandinên xwe de qala itîfaqa Rûsya, Tirkiyê ya derbarê Idlibê de jî kir û got: Itîfaq li gorî berjewendiya herdu welatan li dijî berjewendiya gelên Sûriyeyê ye. Ji ber ku ti feydeya gelên Sûriyê tê de tune ye, wê bi ser nekeve. Pêşeroja gelên Sûriyê wê bi itîfaqa du dewletên derve ku beşekî girîng ji axa Sûriyê dagir kirine, neyê destnîşankirin. Di bingeh de ev aliyên ku li ser hesabê gelên Sûriyê itîfaqan çêdikin, dirêjkirina aloziyê û mayîndebûna dagirkeriyê armanc dikin. Hebûna xwe ya ne meşrû ji bo berjewendiyên xwe li ser vê xakê li dijî hev û gelên Sûriyê bikar tînin.

### LI DORA ARMANCÊN PARTIYÊ BICIVIN

Seroka şaxa Partiya Sûriya Pêşerojê li Efrînê Mihemed Enwer Mihemd di dawiya nirxandinên xwe de bang li tevahî gelên Sûriyeyê kir ku li dora Partiya Sûriya Pêşerojê bicivin û guh nedin alavên ragihandinê ên dijmin ku têkbirina îradeya gelê Sûriyê û dagirkirina axa wê hedef dikin û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: Em ê ji bo ewlekariya vî welatî, pêkanîna demokrasiyê, jiyana hevbeş û avakirina welatekî nenavendî heya dawiyê têkbikoşin.



# Feraseta ku Dr. Sîrwan şehîd xist didome

**Hêzên PDK'ê di sala 1995'an de Dr. Sîrwan û tevî çare hevalên wî şehîd xistin. Tevî ku 22 sal li ser şehadeta Dr. Sîrwan re derbas buye lê hê jî ew feraseta PDK'ê dewam dike. Birayê Dr. Sîrwan, Yasîn Elî diyar kir ku Dr. Sîrwan kesayetekî netewî bû û girîng dida yekîtiya gelê Kurd."**



Di ser şehadeta Dr. Sîrwan ku ji aliyê hêzên PDK'ê ve hatibû qetilkirin re 22 sal derbas bûn, lê hîn jî li Başûrê Kurdistanê pirsgirêka yekîtî, parçebûn û netewî nehatiye çareserkirin, Kurd dîsa dibin qurbaniyên polîtîkayên hêzên derve.
Îro 22. Salvegera şehîdbûna pêşengek û şoreşgerekî netewî yê Başûrê Kurdistanê ku bi destê PDK'ê hatiye şehîd xistin, Dr. Sîrwan (Kawa Elî Salih) e. Dr. Sîrwan di sala 1964'an de li gundê Çemîle yê navçeya Şarbajêr ya ser bi bajarê Silêmaniyê ji dayik dibe. Dr. Sîrwan di sala 1984'an de li Bexda beşa zanist û zimanê Ingilîzî diqedîne. Di sala 1994'an de weke rojnameger û nivîskarek di rojnameya Welat de dest bi kar dike û di pêşxistina rojnameyê de rolek girîng dilîze. Bi boneya salvegera şehîd bûna Dr. Sîrwan birayê wî Yasîn Elî behsa jiyan û têkoşîna şoreşgerê netewî dike û dibêje, "Di 16 saliya xwede dest bi xebat û têkoşîna netewî kir."

### LI EWROPAYÊ ERNK'Ê NAS DIKE

Şehîd Dr. Sîrwan naskirina xwe ya ji bo Tevgera Azadiya Kurdistanê li saheya Ewropa bi rêya Eniya Rizgariya Netewî ya Kurdistanê (ERNK) re çêdibe. Ji ber naskirina xwe ya bi PKK'ê re biryarê dide ku derbasê Sûriyê bibe û perwerdeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bibîne. Yasîn Elî li ser naskirina Dr. Sîrwan a bi Tevgera Azadiya Kurdistanê re jî wiha got, "Li saheya Ewropa bi rêya ERNK'ê têkoşîna azadiya Kurdistanê nas kir û di dawiya salên 1990'an de bû endamê ERNK`ê. Dr. Sîrwan dema li Amsterdamê bû biryar da ku di perwerdeyeke Rêberê Gelê KUrd Abdullah Ocalan re derbas bibe."
Yasîn diyar kir ku Dr. Sîrwan piştî li Sûriyê perwerdeya Ocalan dît biryar dide ku careke din vegere Başûrê Kurdistanê û têkoşîna xwe ya ji bo azadiya Kurdistanê li welat bidomîne. Yasîn wiha behsa vegera Dr. Sîrwan dike; "Piştî perwerdeyê biryar da ku vegere Başûrê Kurdistanê. Wê demê jî rewşa Başûrê Kurdistanê gelek xirab bû û ji bilî Dihok, Hewlêr û Silêmanî hemû xaka Başûr ketibû destê hêzên rejîma Baas'ê de. Dema ku vegeriya Başûrê Kurdistanê di sala 1991'an de, li Xakurkê li gel çend hevalên xwe Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) avakirin. Di wê salê de Raperîna mezin ya Başurê Kurdistanê destpê kir û Dr. Sîrwan jî di wan raperînan de weke pêşeng cih girt. Di şerek li herêma Germiyanê ya li dijî rejîma Baas de bi giranî birîndar bû.
Di sala 1995'an de amadekariyê avakirina Yekîtiya Nîştimaniya Demokrata Kurdistanê(YNDK'ê) dike. Di heman salê de YNDK dibe yek ji aliyekî siyasî yê Başûrê Kurdistanê. Wê demê YNK û PDK hebûn, YNDK jî bû aliyê sêyemîn yê Kurd. Dr. Sîrwan jî bû sekreterê YNDK'ê. Wê demê ji ber YNK ji nava bajaran derketibu û li ser sînorên Iraq û Îranê bi cih bûbû, Silêmanî di destê PDK'ê de mabû. Jiyana welatiyan jî di wê demê de pir xirab bû û ti garantiyek ya jiyana gel nebû. Ji ber wê çendê Dr. Sîrwan û çend hevalên xwe li çemê Rêzan bi cih bûn, ji bo cesaret û baweriyê bidin gel. Pêşmergeyên PDK yên ji çar aliyan ve wan dorpêç kirin. Lê tevî hemû guftugoyên di navbera wan de jî, di 4'ê Cotmeha sala 1996'an de carekê din pêşmergeyên PDK`ê Dr. Sîrwan û çar hevalên wî yên bi navê Hacî Qamişloyî, Baban, Diyar Mêrdînî û Egîd Germiyanî şehîd xistin."

## DYA'yê peymana 63 salan betal kir



Piştî ku Dîwana Edaletê ya Navneteweyî biryar da ku divê pêkanînên DYA'yê yên li ser Îranê bandorê li rewşa însanî û seferên balafiran ên sivîl neke, Washîngtonê ragihand ku wan peymana sala 1955'an a ji biryarê re bûye hincet, betal kirine.
Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) meha Gulanê bi rengekî yekalî xwe ji peymana nukleerê ya bi Îranê re vekişandibû û li dijî Îranê dest bi pêkanînan kiribû.
Rêveberiya Îranê jî ragihand ku ev pêkanîn binpêkirina "Peymana Konsolosî û Têkiliyên Aborî û Wekheviyê ye" ku sala 1955'an di navbera DYA û Îranê de hatibû îmzekirin. Rêveberiya Îranê bi vê hincetê serî li Dîwana Edaletê ya Navneteweyî dabû. Dîwana Edaletê jî biryar da ku Îran di vê mijarê de mafdar e. Washîngtonê jî di ser vê peymana ku zêde nayê zanîn, bersiv da.

### DIVIYABÛ BERÎ 39 SALAN HATIBÛYA BETALKIRIN

Peyman di dema rejîma Şah de hatibû îmzekirin. Wezareta Karên Derve ya DYA'yê li ser betalkirina peymanê daxuyanî da û diyar kir, peyman beriya niha bi dehan salan kevn bûye. Wezîrê Karên Derve Mîke Pompeo destnîşan kir ku peyman diviyabû sala 1979'an di dema desthilatdarbûna rejîma Molla de bihate betalkirin. Pompeo îdîa kir ku Dîwana Edaletê ya Navneteweyî ya li Laheyê biryarên polîtîk daye. Di biryara dadgehê de hatibû ragihandin ku DYA'yê bi têrkerî garantî nedaye ku pêkanînên li ser Îranê ferz dike bandorê li rewşa însanî neke.

## Ji ber zextan rewşa Îranê hesas e


Lîderê Olî yê Îranî Alî Xamaney anî ziman ku ji ber zoriyên aborî û zextên DYA'yê yên li ser civaka Îranê di pêvajoyeke hesas re derbas dibin.
Lîderê Şoreşa Komara Îslamî ya Îran û Lîderê Olî Alî Xamaney li Tehranê di civîna li pêşberî bi hezaran endamê Basîc ên paramilîter û muhafizên Şoreşê axivî. Xamineyî got: "Rewşa welat, herêm û rewşa dinê, bi taybet ji bo me, Îraniyan pir hesas e." Lîderê Olî got: "Hesas e ji ber ku li aliyekê qêrîna hêzên mezin û polîtîkayên Amerîka heye, li aliyê din pirsgirêkên aboriya welat, debara welatiyên ku nikarin debara xwe bikin kir lewaz bûye.
Xamineyî got: "Divê em şemaqekî li DYA bidin û guşarên wan vala derbixin. Bi destûra xudê em ê guşarên wan vala derbixin. Valaderxistina guşaran tê wataya serneketina Amerîka (…) serneketina Amerîka tê wateya ku şemaqek ji destê gelê Îranê xwarinê."



## Em li dijî tecrîda li ser Ocalan derkevin

Meclîsa Jinan a HDP'ê, destnîşan kir ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan yekan e astengiya mezin a pêşiya aştiyê ye. Meclîsa Jinan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), encamnameya civîna Meclîsa Jinan a di dîroka 28'ê Îlona 2018'an de pêk hat ji raya giştî re parve kir. Di encamnameyê de wiha hat gotin: "Krîza aborî û bandora krîzê ya li ser jinan, bi şerê li herêmê, tundî û şerê li dijî destkeftiyên jinan tên jiyîn ve girêdayî ye. Di vê çarçoveyê de hat gotin ku divê jin têkoşîna xwe mezintir bikin."
Her wiha di encamnameyê de hat gotin: "Tecrîda li ser Rêberê Gelê Krud Abdullah Ocalan kûrtir dibe. AKP'a kuxwe li ser şer, dagirkerî û êrîşên li Sûriye û Rojhilata Navîn ava kiriye, êrîşên xwe yên li ser gelê Kurd berdewam dike. Tecrîda li ser Birêz Abdullah Ocalan bi awayekê sîstematîk her roja diçe mezintir dibe. Ev tecrîda li ser Ocalan belavî hemû civakî hatiye kirin. Ji bo ku rêyên demokratîk û aştiyane li welat bên vekirin, divê em li dijî tecrîda li ser Birêz Ocalan derkevin. Li dijî dijminantiya demokrasî û jinan, desthilatdariya zilam û faşîzmê, têkoşîn û berxwedan li hemû qadên jiyanê berdewam dike û wê bidome."





## Başûrê Kurdistanê û qaşo rêveberiya herêmê

**Mihemed SEYDÎ**

Sala 1992 di 4 cotmehê de Parlemena başûrê Kurdistanê piştî hilbijartinên heman salê dewleta federe a Kurd li başûrê kurdistanê ragihand. gavên ber bi statuyekê ve hatin avêtin. Piştî zêdeyî 25 salan rewşa ku heye û dewleta federe ya li başûrê kurdistanê li ber çavaye. Di nava ewqas sal de çi bingeh ji bo statû an jî bingehê herêmeke serbixwe hatiye ava kirin ji bilî parçekirina zêde di nava partî û civakê de.
Li başûr Kurdistanê van aliyên siyasî ji bo gelê kurd û civaka kurd ti carî tiştek pêşkeş nekirin û xizmete jî nekirine, yê ku berovajî vê bibêje gelo li ku jiyan dike.
Em dikarin bibêjin ku xizmet kirin lê ne ji bo Gelê kurd li Başûrê kurdistanê. Ji bo malbatên xwe û hêzên dagirker ên li ser kurdistanê xizmetên baş kirine û bûne begçiyên baş li ber deriyê wan.
Ji sala 2014 ve hilbijartin pêk nehatibûn û hikumeta qaşo ya başûrê kurdistanê ku dema wê li gorî destûr jî qediya bû xwe bi kursiyê de girtibû û serokê herêmê ' Mesûdê Berzanî" li ser kursiyê ranedibû, Nedibû rabe li gorî wan, xwe tenê ji bo vê kursiyê didîtin û ev kursî tenê ji bo xwe didîtin. Ê gelo di van salên dawiyê de ku PDK'ê û YNK xwe partiyên kurdî dibînin ji bo kurdîtiye çikirin.
Li Rojavayê Kurdistanê Şoreşê dest pê kir wan bi her awayî êriş kirin.
Li başûr li dijî gendelîkarî û diziya dihate kirin gel daket kolanan gefên kuştinê li wan hate xwarin.
Ji wê zêdetir û sosretir ew e ku rojane dewleta Tirk ya di dijminatiya kurdan û kurdistanê de êdî kes nikare veşêre axa başûrê kurdistanê dide ber bombeya.PDK her xwe davêje hembêza wê û hincetan ji wan êrişan re dibîne û derdixe . Ê hey nizam çi ma hun vê civakê Ehmaq dibînin.
Erê raste civaka başûr kurdistanê dengê xwe zêde dernaxe ji ber ku hêviyeke wan a statuyeke wan çêbibe hebû û ji bo wan xewn û xeyal bû. Dibêjin çawa be jî ew yên mene. Lê heta cihekî sebir û tehemulî heye.
Beriya çend rojan Dîsa hilbijrtin pêk hatin, helwesta gelê başûrê kurdistanê derket holê. Her tişt boykot kirin. Rêjeya ku neçû û dengê xwe nedan ji zedî 50 zêdetir bû. Hin aliyên di rewşa îraq û başûrê kurdistanê de pispor bi navê ku partiya boykot bi ser ket hilbijartina li başûr nirxandin. Yanî partiya Boykot helwesta gel a li hember van hilbijartinan ne û partiyan dizî û gendeliyê yên ku xwe serketî dibînin.Ji xwe herêma başûrê kurdistanê 2 parçeye ku encamê hilbijartinê çi dibin bila bibin. Yanî YNK'ê çiqas dengan bi dest bixe jî wê nikaribe biçe Hewlêre. PDK'ê jî çiqas dengan bi dest bîne û kursiyan qezenc bike wê nikaribe derbasî Silêmaniyê bibe. Ji ber van hewlestan par di van rojan de ewqas destketiyên gelê kurd li başûrê kurdistaê piştî raferandoma malbata Berzanî radestî hêzên dagirker ên li ser kurdistanê hatin kirin.. lê niha jî derdikevin û tu dibêjî qeyî tiştek nebûye diaxivin. Xwe li dijî dagirkeran bê deng dikin û dibin hevkarê dagirkeran.
lê êdî hêrsa gelê başûrê kurdisatanê gihiştiye sînorê dawiyê û li ber teqandinê ye.. Lê ji ber ku baweriya wan bi ti aliyan heta niha nayê, û ti aliyan ji bo xwe wekî hêviya xilasî û pêşeng nabînin xwe niha bêdeng kirine.
Lê şoreş tê û ji bo Başûrê Kurdistanê şoreşeke Kurdistanî pêwiste êdî..